# Agahî derbarê navenda pêşwazîkirinê



Di vê pakêta agahiyan de agahiyên derbarê karûbarên navenda pêşwazîkirinê, xizmetên navenda pêşwazîkirinê û şîret û rênîşandanên bo meşandina karûbarên xwe li navenda pêşwazîkirinê didin te.

Ji navenda pêşwazîkirinê û Daîreya Koçberan hinek daxuyanî û şîretên din jî didin te. Di wan de agahiyên giring hene. Wan baş bixwîne.

Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

# Naverok

**Agahî derbarê karûbarên navenda pêşwazîkirinê**
- Karmendên navenda pêşwazîkirinê alîkariya te dikin
- Aktîv be û beşdarî meşandina karûbarên xwe bibe
- Herdem nûtirîn agahiyên xwe yên têkilîdanînê bide
- Herdem li navenda pêşwazîkirinê bi awayekî maqûl miamele bike
- Pêşkêşkirina nêrînan

**Bicihbûna li navenda pêşwazîkirinê**
- Pêbendî qeyd û bendên bicihbûna giştî be
- Bicihbûna li bicihbûneke xusûsî
- Neqilbûna navendeke din ya pêşwazîkirinê

**Agahî derbarê xizmetên navenda pêşwazîkirinê**
- Şîret û rêberiya giştî
- Xizmetên civakî
- Xizmetên xizmetên tenduristiyê
- Pareyê ku bo xizmetên pêşwazîkirinê tê standin
- Pareyê pêşwazîkirinê
- Karta paredanê
- Kursa civakî Fînlandayê
- Xebata kar û xwendinê
- Tercimanî
- Alîkariya vegerîna dilxwazane
- Navenda pêşwazîkirinê agahiyên te bi kar tîne
- Neqilbûna bajarekî

**Rêberî û şîretên miamelekirina li navenda pêşwazîkirinê û birêvebirina karûbarên xwe**
- Meşandina karên xwe li navenda pêşwazîkirinê
- Karûbarên haletên acîl
- Derketin û hazirnebûna xwe ji navenda pêşwazîkirinê ragihîne
- Zarok û malbatên zarokdar
- Pêşxistina şiyan, serbixweyî û xweşhaliya xwe
- Xwendekarî li navenda pêşwazîkirinê
- Karkirin
- Mijûlahî
- Tedbîrên aborî

**Agahiyên zêdetir**

# Agahî derbarê karûbarên navenda pêşwazîkirinê

## Karmendên navenda pêşwazîkirinê alîkariya te dikin

Li navenda pêşwazîkirinê bi taybetî karmendên xizmetên civakî, xizmetên tenduristiyê û xizmetên rêberî û şêwirmendiyê kar dikin.

Karmendên navenda pêşwazîkirinê di xizmeta te de ne û dikarî herdem ji wan bipirsî eger hewceyî alîkariyê bî yan pirsek te mijûl bike.

Karmendên navenda pêşwazîkirinê bi awayekî bêalî dixebitin û bi wekhevî li miamele li gel hemû mişteriyan dikin.

Karmendên navenda pêşwazîkirinê biryaran li ser îqameyan nadin û nikarin tesîrê li biryarên îqame yan penaberiyê bikin. Biryar ji aliyê Daîreya Koçberan ve tên dan.

Herdem bi şîretên ku karmendên navenda pêşwazîkirinê didin te bike.



# Aktîv be û beşdarî meşandina karûbarên xwe bibe

Li gor zanîn û şiyanên xwe beşdarî meşandina karûbarên xwe bibe. Armanc ew e ku heta mimkin be tu bi awayekî serbixwe karûbarên xwe bimeşînî.

Herdem hevkariyeke baş li gel karmendên navenda pêşwazîkirinê bike.

# Herdem nûtirîn agahiyên xwe yên têkilîdanînê bide

Piştrast bike ku navenda pêşwazîkirinê herdem nûtirîn agahiyên te yên têkilîdanînê (hejmara telefonê, navnîşan û navnîşana emailê) hene daku karmend têkilî bi te re deynin eger pêdivî be.

# Herdem li navenda pêşwazîkirinê bi awayekî maqûl miamele bike

Divê navenda pêşwazîkirinê bo her kesî cihekî biewle yê jiyan û karkirinê be.

- Ihtiramê li mişteriyên din, li karmendên navenda pêşwazîkirinê û li malê navenda pêşwazîkirinê bigire.

Navenda pêşwazîkirinê hinek qeyd û bend hene ku divê tu bi wan bikî. Her cûre şidet yan tevgera acizker li navenda pêşwazîkirinê mitleqen qedexe ye. Eger tu li navenda pêşwazîkirinê şidetê yan acizkirineke din bibînî, karmendên navendê jê haydar bike.

Li cihên giştî yên navenda pêşwazîkirinê çavdêriya kamerayê heye. Odeya te û tuwalet û hemam nayên çavdêrîkirin.



Dikarî nêrînên xwe ji navenda pêşwazîkirinê bibêjî.



# Pêşkêşkirina nêrînan

Ji karmendên navenda pêşwazîkirinê bibêje eger tu razî bî, eger tiştek te mijûl dike yan dixwazî pêşniyazekê bikî. Nêrînên te alîkariya navenda pêşwazîkirinê û herwiha Daîreya Koçberan jî dikin ku karûbarên xwe binirxînin û pêş bixin.

Dikarî şikayeteke îdarî ji Daîreya Koçberan re binivîsî eger guman bikî navenda pêşwazîkirinê yan karmendên wê tiştekî neqanûnî kiriye yan erkên xwe bi cih neanîne. Berî ku şikayeteke îdarî binivîsî, eger qet mimkin be, pêşî li gel navenda pêşwazîkirinê yan karmendên wê biaxive. Eger şaşiyek çêbûbe, mijar dikare were zelalkirin û piştî gotûbêjê zû were çareserkirin.

Li ser malpera internetî ya Daîreya Koçberan şîretên çawaniya şikayetkirina îdarî hene. Eger hewce be, dikarî ji navenda pêşwazîkirinê alîkariya şikayetkirinê bixwazî.

# Bicihbûna li navenda pêşwazîkirinê

Bicihbûna li navenda pêşwazîkirinê bicihbûneke giştî ya li gel kesên din e. Navenda pêşwazîkirinê odeyekê yan malekê pêşkêşî te dike ku tu û hin mişteriyên din bi hev re lê dijîn. Ode yan mala te dibe ku di dema bicihbûna te ya li navenda pêşwazîkirinê were guherandin.



# Pêbendî qeyd û bendên bicihbûna giştî be

Li navenda pêşwazîkirinê mirovên ji netewe, kultûr û paşxanên cuda dijîn. Hinek qeyd û bendên bicihbûnê hene ku divê her kes pêbendî wan be. Rêz û ihtiramê li mişteriyên din û bawerî, kultûr û edetên wan bigire.

- Her kesî maf heye ku baweriyeke dînî hebe û li gor wê bike, baweriya xwe îfade bike yan aîdî civateke dînî be yan ne aîdî be. Îbadetê xwe li cihên giştî yên navenda pêşwazîkirinê neke daku ew xelkê aicz neke.
- Nabe ku li navenda pêşwazîkirinê çekan yan madeyên hişber hilgirî yan bi kar bînî. Bikaranîn û hilgirtina madeyên hişber li Fînlandayê dijî qanûnê ye. Eger te amûrên wisa hebin, ku dikarin bibin sebebên ziyan yan xeterê, dikarin wan ji te bistînin.
- Kelûpelên odeyê û malê yên navenda pêşwazîkirinê ne. Nabe ew werin firotin, veguhartin, veşelandin yan birin. Bibêje navenda pêşwazîkirinê eger kelûpelên li ode yan mala te bişkên. Tenê bi ruxseta karmendan dikarî mobîlyayên xwe bînî navenda pêşwazîkirinê.
- Pêbendî wan deman be ku te li gel navenda pêşwazîkirinê û hevmaliyên xwe li hev kiriye bo nimûne bo çêkirina xwarinê, şûştina cilan û bikaranîna hemû cihên giştên.



- Li hindir cigare nekêşe. Cigarekêşan tenê li derve li cihên diyarkirî yên cigarekêşanê mimkin e.
- Ewlehiya şewatê piştrast bike. Çavdêrî bikaranîna aletên elektrîkî anku karebayî be. Ji karmendên navendê alîkariyê bixwaze eger elektrîk yan alet nexebitin. Ti tiştekî li ser tebaxê nehêle.
- Navenda pêşwazîkirinê bo nimûne rûnivînan, amûrên malînê û kaxezên avdestxaneyê dide te. Tu haydarî paqijiya mal yan odeya xwe be. Herdem piştî bo nimûne piştê çêkirina xwarinê metbexê bimale. Gilêşan bibe cihên komkirina wan.
- Avê bi teserif bi kar bîne. Dema serşokê kurt bike, serşokê dema sabûnlêdanê bigire û avê li dereceyeke germiyê ya bikêrhatî bi kar bîne.
- Li kilîlên ode û malê miqate be.
- Dema bêdengiyê, bi awayekî hiştî saet 22.00–07.00, nerehetkirina mişteriyên din bi dengê bilind, muzîkê yan dengûdoreke din qedexe ye.
- Mêvan nabe ku bi şev li navenda pêşwazîkirinê bimînin.
- Karmendên navenda pêşwazîkirinê dikarin bi berdewamî û li gor pêwîstiyê rewşa ode yan malê teftîş bikin.



# Bicihbûna li bicihbûneke xusûsî

Dikarî bo xwe bicihbûneke li derveyî navenda pêşwazîkirinê peyda bikî. Ji wê re bicihbûna xusûsî tê gotin. Dikarî bo nimûne li cem mirovên xwe, hevsera/ê xwe yan nasên xwe bi cih bibî. Dikarî herwiha bo xwe malekê ji xwediyê wê yan ji kirêgirên serekî kirê bikî.

**Ji van tiştan agahdar be dema ku li bicihbûneke xusûsî bijî:**

- Cihê bicihbûnê divê xaniyekî bo bicihbûnê be ku bo navnîşana poste tê.
- Divê tu li navnîşana ku te daye bi cih bibî.
- Daxuyaniya navnîşana bicihbûna xwe ya nû bide posteyê.
- Bi nivîskî navnîşana bicihbûna xwe ya te peydakirî bide navenda pêşwazîkirinê. Herdem hemû guherînan ji navendê re bibêje.
    - Ev giring e daku mafê te yê wergirtina xizmetên pêşwazîkirinê berdewam be û Daîreya Koçberan bikare derbarê dawayên te têkilî bi te re deyne.

# Neqilbûna navendeke din ya pêşwazîkirinê

Mişteriyatiya navenda pêşwazîkirinê tiştekî demkî ye. Dibe ku derfet tine ku hemû dema ku tu mişteriyê xizmetên navenda pêşwazîkirinê li eynî navenda pêşwazîkirinê bimînî.

Derfeta mayînê yan neqilbûna navendeke din ya pêşwazîkirinê li gor wê yekê ye ka çawa cih li navendan heye. Dibe ku cihekî vala li bajarekî wisa tine be ku tu filan demê dixwazî lê bijî. Loma tu bi xwe nikarî biryar bidî yan hilbijêrî ka li kîjan navendê bi cih dibî.

Dikarin te neqil bikin navendeke din ya pêşwaîkirin eger ew ji ber rewşa te, ji ber karûbarên navenda pêşwazîkirinê yan karbidestan yan bo meşandina dawaya te pêdivî be. Herwiha dikarin te neqlî navendeke din bikin eger karûbarên navenda te biqedin yan tu destpêkê, gava ku gihiştî vî welatî, li navendeke derbasbûnê anku navendeke transit ya demkurt hatî bicihkirin.

**Dikarî herwiha ji navenda xwe ya pêşwazîkirinê bipirseî ka neqilbûna bo navendeke din ya pêşwazîkirinê mimkin e eger:**

- te karek ji bajarekî din peyda kiriye
- te cihekî xwendinê peyda kiriye ku te bigihîne bawernameyekê û li bajarekî din e yan
- malbata te ya nêzîk li navendeke din ya pêşwazîkirinê dijî. Mebest ji malbata nêzîk bav, dayik, hevser û zarokên kêmtirî hejdeh salî ne.

Navenda pêşwazîkirinê ji karûbar û birêkxistina praktîkî yên neqilbûnê berpirsiyar e.



# Agahî derbarê xizmetên navenda pêşwazîkirinê

Navenda pêşwazîkirinê xizmetên te yên pêşwazîkirinê yên pêdivî bi rêk dixe. Qanûn diyar dike ka mafê te yê çi xizmetan heye.

**Xizmetên navenda pêşwazîkirinê ev in**

- bicihbûn
- xizmetên civakî
- xizmetên xizmetên tenduristiyê
- pereyê pêşwazîkirinê
- xebatên kar û xwendinê
- tercimanî û
- alîkariya vegerîna dilxwazane.

**Herwiha navenda pêşwazîkirinê agahiyan dide te bo nimûne derbarê**


- maf û erkên têkilî mişteriyatiyê
- qeyd û bendên navenda pêşwazîkirinê û
- civaka Fînlandayê.

Herwiha navenda pêşwazîkirinê rêberî û şîretan di mijarên jiyana rojane de pêşkêşî te dike.

Eger li bicihbûneke xusûsî bijî, lêçûnên te yên bicihbûnê, wek kirê, elektrîk û pereyê avê, ji te re nayên dayîn. Bicihbûn yan peydakirina wê ji aliyê aborî ve nayê piştgirîkirin.

## Şîret û rêberiya giştî

Rêberên navenda pêşwazîkirinê dikarin rêberî û şîretan bidin te di haletên cuda yên jiyana rojane de û bersiva pirsên li ser bicihbûna li navenda pêşwazîkirinê bidin.





# Xizmetên civakî

**Karmendên civakî û rêberên civakî yên navenda pêşwazîkirinê dikarin rêberî û şîretan bidin te û alîkariya te bikin di van mijaran de:**

- xwedîkirina zarok û xortan û dêbavîtî
- çûna xwendingehê û xwendekarî
- pêşxistina şiyan û rewşa xwe
- meşandina karûbarên xwe bi serbixweyî
- pirsgirêkên derûnî û pirsgirêkên madeyên hişber
- hewcehiyên taybet yên pîrbûnê
- hewcehiyên taybet yên seqetiyê

Eger pêdivî alîkariyê bî, têkilî bi karmendên xizmetên civakî yên navenda pêşwazîkirinê re deyne.

# Xizmetên xizmetên tenduristiyê

Hemşîre û peristarên tenduristiyê yên navenda pêşwazîkirinê xizmetên xizmetên tenduristiyê bo te pêşkêş dikin.

Peristarên navenda pêşwazîkirinê pêdiviya te ya bi çarekirinê dinirxînin, te çare dikin û eger hewce be, te dişînin xizmetên tenduristiyên derveyî navendê.

Gava ku tu yekem car tê navenda pêşwazîkirinê, teftîşeke tenduristiyê ya destpêkî ji te re tê kirin ku dilxwazane ye. Di teftîşa tenduristiyê ya despêkî de rewşa tenduristiya te û xizmetên ku belkî pêdiviya te pê hebe tên ronkirin. Bo teftîşa tenduristiyê agahiyên derbarê tenduristiya xwe bîne yan wan ji peristaran re bibêje. Peristar dê te bişînin lêkolînên din yên bo nimûne wek lêkolîna vebijartina êşên vegir.

Eger pêdivî alîkariyê bî, têkilî bi karmendên xizmetên tenduristiyê yên navenda pêşwazîkirinê re deyne.

# Pareyê ku bo xizmetên pêşwazîkirinê tê standin

Eger li navenda pêşwazîkirinê bi cih bibî û li ser karekî bi meaş bî, dikarin pareyên xizmetên pêşwazîkirinê ji te wergirin. Pare herwiha dikare ji te were wergirtin eger maliyeta te hebe. Bibêje navenda pêşwazîkirinê eger li ser karekî bî yan wek din maliyeta te hebe.




---

# Pareyê pêşwazîkirinê

Dikarî pareyê pêşwazîkirinê wergirî eger dahat û maliyeta te yan malbatiyên te têrî lêçûnên zerûrî yên rojane, wek xwarin û cilan, neke. Dikarî pareyê pêşwazîkirinê ji navenda pêşwazîkirinê dawa bikî.

Pareyê pêşwazîkirinê bo dabînkirina pêdiviyên bingehîn in.

Pareyê pêşwazîkirinê bi otomatîkî nayê dan loma divê tu bi xwe dawa bikî. Divê tu ji navenda pêşwazîkirinê re dahat û maliyeta xwe bibêjî eger dawa pareyê pêşwazîkirinê bikî. Herwiha hemû dahat û maliyeta te ya li derveyî welat jî tesîrê li meblexa pareyê pêşwazîkirinê dikin eger bikarî wan li Fînlandayê bi kar bînî.

Pareyê pêşwazîkirinê beşan pêk tê ku beşa bingehîn û beşa temamker in. Beşa bingehîn ya pareyê pêşwazîkirinê bo nimûne bi cilan, lêçûnên kêm yên xizmetên tenduristiyê, bilêtên hatinûçûna deverê û heqê bikaranîna telefonê ne.

Beşa bingehîn ya pareyê pêşwazîkirinê herwiha bo lêçûnên xwarinê ye eger navenda pêşwazîkirinê xwarinan pêşkêş neke.

Ji bilî beşa bingehîn ya pareyê pêşwazîkirinê, dikarî herwiha pareyê pêşwazîkirinê yê temamker jî wergirî bo hewcehiyên taybet, bo nimûne bo xwendekariya li derveyî navendê yan pêdiviyên zarokan.



# Karta paredanê

Pareyê pêşwazîkirinê û meaşê ku ji karê ku eger tu bikî didin ser karteke paredanê ya taybet ya Daîreya Koçberan yan hejmareke bankî ya fînlandî. Pareyê pêşwazîkirinê yê hemû malbatê didin ser eynî kartê. Karta paredanê ya Daîreya Koçberan tenê li Fînlandayê kar dike. Navend şîretên bikaranîna kartê dide te.



---



# Xebata kar û xwendinê

Navenda pêşwazîkirinê b omişteriyên li navendê bicihbûyî xebatên kar û xwendinê saz dike. Redkirin yan terkexemî di xebatên kar û xwendinê de dikare bibe sebebê kêmkirina pareyê pêşwazîkirinê.

Xebata xwendinê xwendina zimanê fînlandî yan swêdî ye. Xebata kar bi taybetî malîn û paqijkirina cihên bicihbûnê ye.

---

# Kursa civakî Fînlandayê

Navenda pêşwazîkirinê Kursa civaka Fînlandayê pêşkêş dike. Kurs agahiyên bingehîn yên giring derbarê civaka Fînlandayê, qanûn, dîrok û edetên Fînlandayê dide.

Li gel kursê herwiha materyalên xwehînkirinê û kurseke torî jî heye. Tê payîn ku her mişteriyekî navenda pêşwazîkirinê wê kursê biqedîne.



# Tercimanî

Karmendên navenda pêşwazîkirinê dikarin terciman bang bikin bo alîkariyê di haletên wisa de ku mijarên giring tên birêvebirin.

Terciman bi awayekî giştî bo hevdîtinên li gel karmendên civakî, rêberên civakî û peristarên tenduristiyê yên navenda pêşwazîkirinê û herwiha bo hevdîtinên bi bijîşk re tê bangkirin. Tercimanî ne herdem illeh bi zimanê te yê dayikî ye eger tu têra xwe zimanekî din bizanî.

Hewl tê dan ku haletên rojane yên navenda pêşwazîkirinê bêyî terciman werin birêvebirin.




Terciman herdem xwedî erkê nepenîparastinê ne.

---

# Alîkariya vegerîna dilxwazane

Navenda pêşwazîkirinê bi berdewamî agahiyên derbarê vegerîna dilxwazane ya alîkarîkirî û şîretên vegerînê pêşkêş dike. Mebest ji vegerîna dilxwazane ya alîkarîkirî ew e ku dikarî alîkarî û piştgiriyê wergirî bo vegerîna welatê xwe. Eger bixwazî bibihîzî û agahiyên derbarê vegerîna dilxwazane ya alîkarîkirî wergire, têkilî bi karmendên navenda pêşwazîkirinê re deyne.



# Navenda pêşwazîkirinê agahiyên te bi kar tîne

Bikaranîna agahiyên kesî beşek ji erkên qanûnî yên navenda pêşwazîkirinê ye. Navenda pêşwazîkirinê agahiyên te bi ewle û li gor qanûnê bi kar tîne.

Agahiyên te dikarin bo aliyên derveyî navenda pêşwazîkirinê werin dan tenê ji wan aliyan re ku af heye di karê xwe de agahiyên te bi kar bînin û te bo dayîna agahiyan razîbûna xwe daye.

Eger neqlî navendeke din ya pêşwazîkirinê bibî, agahiyên te bi otomatîkî neqlî wê derê tên kirin.



Mafê te heye dawa bikî bibînî ka çi agahî û têbînî derbarê te hatine nivîsîn.



## Neqilbûna bajarekî

Eger îqameyekê û mafê dawakirina bajarekî bikî, tê payîn ku dawa neqilbûnê bikî û mişteriyatiya navenda pêşwazîkirinê derkevî.

Karmendên navenda pêşwazîkirinê rêberiya te dikin daku neqil bibî bajarekî û alîkariya peydakirina malekê ji te re dikin.

# Rêberî û şîretên miamelekirina li navenda pêşwazîkirinê û birêvebirina karûbarên xwe

## Meşandina karên xwe li navenda pêşwazîkirinê

Demên vekirîbûna nivîsgeha navenda pêşwazîkirinê û awa û agahiyên têkilîdanînê yên karmendan piştrast bike.

Karmendên navenda pêşwazîkirinê ji te re dibêjin ka çawa dikarî demekê bo xizmetên civakî yan xizmetên xizmetên tenduristiyê li navendê bigirî û di wan karûbarên xwe çawa bimeşînî.

Herdem li dema xwe were hevdîtinan. Eger nikarî werî hevdîtinekê, di zûtirîn demê de bibêje. Eger navenda pêşwazîkirinê bo te demeke xizmetên xizmetên tenduristiyê ji derveyî navendê bigire, bo nimûne li cem bijîşk, hingê jî herdem li dema xwe were hevdîtinê. Di zûtirîn demê de navendê haydar bike eger nikarî werî hevdîtinê.

Li hinek navendan bi taybetî karmendek bo êvar û şevan heye ku mirov dikare di mijarên acîl de têkilî pê re deyne. Ew karmend di pirsgirêkên acîl de alîkariyê dike, bo nimûne di vekirina derî de eger kilîlê te li hindir mabe yan hingê ku di xanî ve kêmasiyeke ciddî heye. Bo nimûne temîrkirina destikê derî yan veguhastina lampeyê ne karekî acîl yê bi şev e.




# Karûbarên haletên acîl

Karmendên navenda pêşwazîkirinê ji te dibêjin ka divê çi bikî eger şewatek derkeve. Eger zengil yan naqosên şewatê lê bidin, piştrast bike ku ti kes di odeyê yan xanî ve namîne, derî bigire û ji avahî derkeve.

Eger ruh, tenduristî yan ewlehî di xeteriyÊ de be, yekser telefonî navenda lihawarhatinê bike: 112. Hejmara giştî ya acîl 112 (ambulans, agirvemirandin û polîs) tenê bo haletên acîl e.

Eger pêdiviya te bi çarekirina acîl hebe, û nikarî têkilî navenda pêşwazîkirinê re deynî, telefonî hejmara alîkariya lihawarhatinê 116117 bike. Karmendên tenduristiyê yên lihawarhatinê bi fînlandî swêdî yan inglîzî ji te re dibêjin ka pêdivî ye ji ber rewşa xwe biçî xizmetên lihawarhatinê yan na. Telefonkirin belaş e.

Hejmara giştî ya acîl 112
Hejmara alîkariya lihawarhatinê 116117



---

# Derketin û hazirnebûna xwe ji navenda pêşwazîkirinê ragihîne

Navenda pêşwazîkirinê car bi car piştrast dike ka tu hê jî li Fînlandayê yî û herceyî xizmetên pêşwazîkirinê yî yan na. Eger navenda pêşwazîkirinê nikare têkilî bi te re deyne, dibe ku êdî xizmetên pêşwazîkirinê nede te û dawî li mişteriya te li navenda pêşwazîkirinê bîne.

Bi pêşwextî navenda pêşwazîkirinê agahdar bike eger tu dê bi xilasî ji Fînlandayê derkevî. Divê tu wê daxuyaniyê bidî heta eger tu li derveyî navendê bijî jî.

Eger tu bi xilasî ji Fînlandayê derkevî, divê tu herwiha dawa xwe ya parastina demkî yan îqame yan dawa xwe ya penaberiyê betal bikî.

Nabe tu ji Fînlandayê derkevî eger dawa te ya penaberiyê hê tê meşandin. Eger tu derkevî, hingê meşandina dawa te ya penaberiyê bi dawî dibe.



# Zarok û malbatên zarokdar

Erk û berpirsiyariya dêbavan e ku li navenda pêşwazîkirinê jî zarokên xwe xwedî bikin.

Li Fînlandayê her cûre lêxistina bedenî ya zarokan qedexe ye.

Cihên lîstinê yên xanî û baxçeyên giştî yên lîstinê dikarin bi serbestî belaş bên bikaranîn. Zarokên biçûk nabe ku bêyî çavdêriya mezinan bi tenê li malê yan li hewşê werin hiştin.

Dikarî bo zarokên xwe dawa cihekî perwerdeya savayan anku baxçeyekî zarokan ji bajarê xwe bikî eger li ser kar bî yan hemî rojê dixwînî yan zarokên te xwedî pêdiviyên taybet in.

Zarokên 6 salî mafê pêşperwerdeyê û zarokên 7 heta 17 salî jî mafê perwerdeya bingehîn heye. Zarokên xwedî erkê xwendingê, anku 7 heta 17 salî, li gorî derfetan beşdarî perwerdeya amadekar yan jî perwerdeya bingehîn dibin. Xwendekariya zarokan tiştekî baş e. Armanc ew e ku hemû zarok li Fînlandayê biçin xwendingehê.

Karmendên navenda pêşwazîkirinê di dawakirina baxçeyê zarokan û xwendingehê de alîkariya malbatan dikin.



# Pêşxistina şiyan, serbixweyî û xweşhaliya xwe

Dikarî bi xwe gelek tiştan bikî ku şiyan, serbixweyî û xweşhaliya te pêş bixin. Dikarî li derveyî navendê bigerî û bimînî. Nasîna derdoran, çalakî û mijûlahiyên xweş û xwepêşveber xweşhaliyê û serdestiya li ser jiyana xwe bihêztir dikin.

Xwendekarî, karkirin û mijûlahî alîkariya hînbûna tiştên nû û xweşhaliya te dikin. Ew dikarin mijûlahiyên xweş bo jiyana te ya rojane bînin. Bi çûna ser karê bimeaş dikarî herwiha bi xwe debara xwe bikî.

- Derdorên navenda peşwazîkirinê binase.
- Têkiliyên bi kesên din re dilê mirovî xweş dikin.
- Li awayên jiyana saxlem piştrast be.
- Têr xew bike û pêbendî rîtmeke rojane ya berdewam be
- Berdewam bilive.
- Xwarineke piralî bixwe û her roj têr avê vexwe.
- Li gor rewşa hewayê cil li xwe bike.
- Destên xwe baş bi sabûnê bişo gava ku tu tê navendê, piştî çûna avdestxaneyê û berî xwarinê.
- Bikaranîna pereyên xwe plan bike.
- Beşdarî çalakiyên rêkxistinan bibe.





# Xwendekarî li navenda pêşwazîkirinê

Eger bixwazî li derveyî navenda pêşwazîkirinê bixwînî, ew mimkin e. Dikarî dawa cihekî xwendingê bikî û wî cihî qebûl bikî eger li gor şert û mercên wê xwendingehê bi xwe mimkin be.

Mafê te nîne ku alîkariyên giştî yên xwendekaran, bo nimûne alîkariya xwendekariyê wergirî. Eger pêdivî be, dikarî pareyê pêşwazîkirinê yê temamker bo xwendekariyê wergirî.

Peydakirina cihekî xwendekariyê nayê wê maneyê ku illeh tu dikarî li Fînlandayê bimînî.



# Karkirin

Eger bixwazî karekî bimeaş bikî, piştrast bike ku mafê te yê karkirinê li Fînlandayê heye. Eger penaxwaz bî, nikarî wek xwedîkar bixebitî.

Eger te parastineke demkî wergirtibe, mafê te heye xizmetên kardîtinê wergirî. Navenda pêşwazîkirinê te dişîne xizmetên nêzîktirîn herêma kardîtinê. Penaxwazan maf nîne xizmetên kardîtinê yên belediyan wergirin.

Karê reş nabe were kirin. Karê reş xebateke neqanûnî ye ku tê de bac yan heqên din yên li gor qanûnê nayên dan.

**Hemû kesên ku li Fînlandayê kar dikin di bin eynî şertên karkirinê de ne. Karker xwedî van mafên jêrîn e:**

- peymaneke kar ya nivîskî û şertên karkirinê
- meaş, dema karkirinê û tatîleke bimeaş li gor peymanên giştî û peymana kar, dem
- bêhnvedanên diyarkirî li dema karkirinê
- tezmînata karê zêde
- jîngeheke karkirinê ya biewle
- xizmetên tenduristiyê yên kar û ruxseta nexweşiyê
- pênasandina kar
- mafê xwebirêkxistinê û endamtiya yekîtiya pîşeyê
- derfeta ragihandina pirsgirêkên li ser ji xwedîkar yan karbidestên parastina kar re.



## Mijûlahî

Navenda pêşwazîkirinê agahiyên derbarê derfetên mijûlahiyê û cihên werzişê dide te.

Li hinek navendên pêşwazîkirinê cih û aletên werzişê, mijûlahiyê yan dema betaliyê hene ku dikarî bi kar bînî.

Eger hewce be, dikarî pareyê pêşwazîkirinê yê temamker bi taybetî bo heqê û aletên mijûlahiyên zarokan wergirî.

## Tedbîrên aborî

Baş e ku tedbîrekê bo bikaranîna pareyên xwe deynî daku pare têrî te bikin. Tedbîra bikaranîna pare baş e heta eger karekî bimeaş jî bikî.

Diyar bike ka çend pare bo bikaranînê di destên te de hene û wan divê bo çi bi kar bînî. Pare bi rêkûpêk bi kar bîne, fiyetan bide ber hev, li hewcehiya kirînan bifikre, piştrast bike ka çend pare bo bikaranînê hene û heta kengî divê têra te bikin.

Feyde ji tenzîlat û erzaniyan bike. Êvaran gelek ji berheman tên erzankirin. Dikanên mezin bi awayekî giştî ji dikanên biçûk erzantir in. Markeyên dikanan bi xwe tercîh bike.

Tiştên bikarînayî bikire. Cilên bikarînayî û pêdiviyên din dikarin bi awayekî erzan li bazarên kevnefiroşiyê û navendên vezivirandinê bên peydakirin.



# Agahiyên zêdetir

**Jiyana rojane li navenda pêşwazîkirinê**
(Migri.fi, bi fînlandî)

**Navendên pêşwazîkirinê**
(Migri.fi, bi fînlandî)

**Rêbera te li Fînlandayê**
(Infofinland.fi, bi fînlandî)